

28ê Gelawêjê, referandoma  
serxwebûna Rojhilat e

»»» R:7



Jidayikbûn bo  
armancek pêroz û  
merivane

»»» R:5



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (404) 22-08-2021 Buha (1000) Tûmen

Ti dîktatorek bo her-  
tim nikare bi tepeseriyê,  
deshilata xwe biparêze

»»» R:6



Kurdiştan û ta-  
lankirina şûnwarên  
dîrokî yên wê

»»» R:10



## Heta ku tê rejîm zêdetir lawaz dibe

**H**êzên Îsrailê şeva 30`ê Gelawêjê ragihandin ku balafirên şerker ên wan çar navenên girîng ên çêkirina çek û teqemenî û embara çek û teqenî ên Hemaşê kirine bi armanc. Şeva berî hingê jî Saziya Çavdêrî ya Mafê Mirov li Sûriyê belav kiribû ku Îsrailê bi sê mûşekan êrîş kiriye ser damezrawe û embarên teqemenî ên Hizbullah Lubnanê.

Bilî wan nûçe û raportên navçeyî, arîşeyên navxweyî jî beşek ji wan hev kêşane ne ku Komara Îslamî zêdetir xîstîye perawêzê û lawaz kiriye; Wezareta Kar û Xweşbîjîviya Civakî di raporeke bin navê “Hêla Hejarî” (Payîşê Feqr) de ragihanidye: Hêla hejarî li sala 1399`an a Rojî bo her takekê pêk hatiye ji 1 milyon û 254 hezar Tûmen ku bi beravirdkirin digel sala derbasbûyî ya wê %38 zêde kiriye; Wate hêla hejarî li sala 1399`an bo malbateke 4 kesî 2 milyon û 758 hezar Tûmen û bo malbatek 4 kesî 3 milyon û 385 hezar Tûmen bûye. Ji aliyek din ve rêjeya hejarên Îranê ku dikevinê bin hêla hejarî, zêdetir ji



27 milyon kes bûye! Hev dem digel wê raportê di heyama derbasbûyî de komek nûçe û zaniyarî di nav torên medyayî de hatine belavkirin ku nîşanderê girîngnebûna pirsê jiyana xelkê di Îranê de bû; Li piraniya bajarên Îranê de rewşa Koronayê roj li pey rojê ber bi xirabûna zêdetir ve diçe û ti rêyeke kiriyarî jî bo derbasbûn ji wê krîzê pêşîya xelkê nîne.

Saziya Cîhanî ya Tendirustiyê bi weşana xerîteya Korona li cîhanê li ser Tiwîterê, behsa vê yekê jî kiriye ku Îran ji hemû welatên cîhanê zêdetir bi vîrûsa Koronayê gemar bûye ku sedema wê a sereke jî neanîna bilez û hewce ya vaksena Koronayê di wî welatî de bû.

Xelkê Îran di wê rewşê de berpirsên rejîmê û nemaze Xamineyî, rêberê rejîma Îranê û

Seîd Nemekî, Wezîrê Tendirustî ê rejîmê bi tawanbar dizanin ku îzn nedan vaksena Koronayê bo Îranê bê anîn û rojane divê şahidê canjidestdana xelkê bin. Tevî wan hemû rewşa xirab ku bi ser xelkê de zal e û huşdariya karnasan û çûna serê ya rêjeya canjidestdayan bi sedema Koronayê, çend navendên vaksînekirina Koronayê jî bi sedema hatina “Aşûra û Tasûa”

hatine dayxistin û eva jî dîsan îsbat dike ku rejîm berjiwendiyên xwe ji canê xelkê bo girîngtir e.

Kûpîka krîzê pêwendîdar bi nexweşiya Korona di Îranê de wê demê xwe zêdetir derdixê ku rejîmê li pirtûka dersî ya “Mutali`atê Îctima`îyê Paye” de îdia kiriye ku rejîma Îranê di warê dermanê Koronayê de ji welatên dinê pêştir e û tê nasîn, eva jî direwek din e ku di sîstema perwerdeya Komara Îslamî de dixine nav mêjiyê zarokan ku ew dahata paşeroja her neteweyekê ne.

Êdî pirsê aloztirbûna rewşa mafê mirov li Îranê her li cihê xwe de ye ku pirsê nû nîne û pêka dawî rapora Raportêrê Taybet ê Saziya Netewên Yekgirtî, rewşa mafê mirov di Îranê de heta ku tê xirabtir û metirsîdartir dibe!

Ser hev ev behsane û mijarane vê raştîyê bo me derdixê, heta ku tê rejîm perawêzkevtî û lawaztir dibe ku divê ev meseleye wek pêşmerca sernixûnîbûna yekcarî a rejîmê bê berhevdanîn.

## Sergotar

## Dîwar



N: Kerîm Perwîzî

Dewleta Yûnanê ragihandiye ku sistema asayîş û ewlehiya ku li sala 2015'an bo pêşgirtin ji pêla penaberan cî bi cî kiribû, dê dûbare bi rê ve bibe. Hevdem eva jî ragihandiye ku pirojeya 40 KM a dîwarkêşan li ser sînorê hişkatiya navbera Yûnan û Tirkîyê dawî pê aniye. Ev dîwarê ku çê kiriye, bi sistema ewlehiya taybet jî tê kontrolkirin û bi vî awayî pêşiya penaberên ku li nav Tirkîyê diçine nav Yûnanê digre, nemaze penaberên Efxanî! Herwisa dewleta Tirkîyê jî ragihandiye ku dîwarê 150 KM a ku di navbera sînorê Îran û Tikiyê de kêşandiye zêdetir dike û dike bi 240 KM.

Di rojên derbasbûyî de dewleta Rûsiyê ragihand ku hêzeke giran a leşkerî dişîne ser sînorê Tacîkiştan û Efxaniştanê da ku bi wê hêzê derzkirina xelkê Efxaniştanê bo nav Tacîkiştanê bigre!

Di sînorên Rojavayê de ji Tirkîyê û Yûnanê dîwarê betonî û ji sînorên Rojhilatê jî, ji sînorê Çîn û Rûsiyê dîwarê tank û zirêhpoş tê danîn da ku xelkê Efxaniştanê ber bi welatên din ve neçin!

Eva eger herwiha wekî nûçeya koç û koçberî çav lê bê kirin, renga bi tişteke asayî bê berçav ku hin welat sînorên xwe qahîm bikin da ku ewlehiya xwe biparêzin û pêşî ji qaçaxkirina mirovan bigrin, lê ku mirov diçe nav



kûrahiya bûyerê, karesatek e ku zêdetir tê berçav.

Dîwarên betonî, tank û zirêhpoş li derdora welatên wekî Sûriye û Efxaniştanê tene kêşandin da ku xelkê wan deran koç nekin! Lê di wan salên derbasbûyî de hêzên leşkerî jî şandine nav wan welatan da ku piştevanîyê ji wê deşhilata ku bixwe pê xweş in, bikin!

Dema ku “Potîn” hêza leşkerî dişande Sûriyê da ku piştevanîyê ji “Beşar El-es`ed” bike, an Rojava li hember piştevanîya welatan ji El-qaîde û Talibanê bêdeng bûn û didîtn ku çekûteqemenî digihîjine deştê Talibanê da ku şer û kavilkarî li Efxaniştanê bidomîne, ne tenê bêdeng bûn, belkî rêk digel piştevanê terorîzm û Taliban, wate Komara Îslamî mijûlê rêkveştin û danûstandin bûn û niha jî dixwazin digel wan rêk bikevin!

Di demekê de ku behs ji cihgîrbûna aştîyê li cîhanê dikin, kiryar wisa nîşan dide ku hin xelk li Rojhilata Navîn divê dîwarê betonî û tank û zirêhpoş li derdora xwe bivehûnînin da ku ji welatên xwe dûr nekevin û aramiya Rûsiye, Çîn û Rojava têk nedin. Eva di demekê de ye ku hakimên wan welatan, ji aliyê yan Rûsiye yan Çîn yan jî Rojavayê ve hatine dîyarîkirin yan her çi nebe bi tundî tene piştevanîkirin! Xumeynî ji Parîsê ve bo Tehranê hate şandin û Xameneyî ji Mosokoyê ve tê piştevanîkirin! Es`ed bi balafirên Rûsiyê maye û eva Taliban jî berhema hevbeş a bazara cîhanê ye!

Terorîzm, kuştar, koçkirina bikom, şerên bê dawî ên Rojhilata Navîn û dîwarên betonî û tank û zirêhpoşên ser sînoran ne tene sekînanandin û ne Rûsiya û Çîn û Rojava jî li pirûskên wî agirî dûr dikevin. Merca yekê ev e ku ev piştevanî ji hakimên dîktator û sepandinkaran nekin û merca duyem jî ev e ku rîşeya terorîzm û şer li Rojhilata Navîn bi anîna gorê ya sistema dadperwerane ku hemû neteweyek mafê xwe bidê, bê hişkkirin.

## *Mîstefa Hicrî: Serbixweyiya siyasî, hevsengî û raştbîn, raştgotin û piştrastbûn, bûne sedemê li ser pêman û berdewambûn di xebatê de*

**L**êpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta 25`ê Gelawêjê salvegera avabûna PDKÎ pey-amek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama Lêpirsiyarê Giştî Bi hilkefta 25`ê Gelawêjê salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê Piştî destpêkirina şerê duyem ê cîhanî ku valatîyek di encama dagîrkirina navçeyên bakur û başûrê Îranê ji aliyê zilhêzên Soviyet, Amerîka û Birîtaniyayê ve hate gorê, digel bi dawîhatina qonaxek ji dîktatora Pehlewî, hevdem derfetek bo vejîna çalakîyên siyasî yên civatgehê û sazîyên siyasî hate gorê.

Di rewşeke wiha de, li 25`ê Gelawêja 1321`ê ya Rojî, li ser destê komek kesayetiyên nîştimanî, Komeleya Jiyaneke Kurd bi bîra serbixweyîxwazî û netewî hate avakirin. Sê sal piştê hingê, Partiya Demokrat a Kurdistan li ser bingeha teşkilatî ya (JK), wek qewareyek netewî-demokratîk lê rêxirawtir û bi bernametir hate avakirin ku heta niha jî, wek kevin-tirîn Hizba Kurdî di jiyana siyasî û rêxirawwyiya xwe de berdewam e.

Di demekê de Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, şemala 76`emîn temenê xwe hil dike, xwendina dîroka wê, qonaxên xebat û têkoşan û herwisa siyasat û rabûn û kevtinên wê, hewce ye jî, ji dîtingeheke rexneyîye ve hewsengandin bo bê kirin û em tiliyên xwe danê ser xalên bihêz û lawz ên wê. Li jîngeha siyasî û civakiya serdema avakirina wê ku civatgehê geşe nekiriye, xala cudaker a wê Hizbê dîtingeha serdemiyane ya wê bo karûbarê rêxistîn û warê rakiraweyiya wê bûye. Pêka gotina Dr. “Qasimlo”yê nemir, xwedî damezrandina hizbê, di dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de xaleke girîng bû û destpêkek



bo pêkanîna rêxiraw û hizba pêşkevî û serdemiyane bû ku bi bernameyeke rohn ve pêngav avête di nav qonax-êke dîrokê de.

Pêngaveke girîng a Partiya Demokrat di meşa dîroka xebat û têkoşanê de veqetîn ji rêxistainîna eşîreyî, malbatî û navçeyî û araştêkirtina xebat ber bi formeke Kurdistanî ve bûye ku wek armanceke mezin, her di cihê xwe de ye. Her ev dîtingehe wisa kiriye ku nasnameya Kurdbûn bibe beşa sereka a gotar û kiriyara wê Hizbê.

Avakirina gotara netewî û hewla bêsêkînanandin bo geşeya bîra Kurdayetî, rehenderêk din a xebata Hizba Demokrat e û bandora wê Hizbê li ser civatgehê bûye. Bi gotar û kiriyar, pêkanîna Komara Demokratîk a Kurdistanê, mînameke dîrokî ye ji karnameya neteweyiya wê Hizbê ku bo hemû qonax û serdemên xebatê, watabexiş e. Komara Kurdistanê pêş ve ku ezmûnek dîrokî be, dibîstaneke hizrî ye ku rêvîng û paşeroja xebata netewî-demokratîka netewa me daye xuya.

Her wek çawa min di pey-amek din de îşare pê kiriye, niha jî digel be, takê Kurd xwe bi hevvelatîyê wê Komarê dizane. Komara Kurdistanê bi wan nîşane û remzan tê nasîn ku beşek in ji nasname û nîşaneyên xebata Kurd li Rojhilatê, ji

wan alaya Kurdistanê, Hêza Pêşmerge û sirûda nîştimanî ku her bixwe cihê îşareyê ne bo berdewamiya armanceke pîroz a wek avabûna desthilateke Kurd û Kurdistanî wek Komara Kurdistanê.

Li tev dîroka siyasî û tevgera netewî-demokratîka Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, kultûra rêxirawî û kultûra siyasîya wê Hizbê ku her ji destpêkê ve faktera serekiya tevgerê nîştimanî bûye, digel tev xalên bihêz ên wê, nabe cavpoşî li xalên lawaz bê kirin.

Serbixweyiya siyasî, hevsengî û raştbîn, raştgotin û piştrastbûn bi xelkê û girêdana çarenivîsiya tevgerê bi hêza navxweyê Rojhilatê û dûrnekevtin ji pîrensîb û hêlên hizrî, beşek ji wan teybetmendîyan e ku tevî kevtin, şikest û veqetîn û şehîdbûna rêberan, bûne sedemê liserpêman û berdewambûna wê li xebatê. Digel wan hemû taybetmendî û nîrx û pîrensîpên ku me îşare pê kir, lê ev Hizbe ji xalên lawaz bêpar nebûye.

Divê em îtirafê bi wê raştiyê bikin ku serhildana arîşe û mîlmilanêya navxweyî ku renge sedema siyasî, hizrî an teşkilatî û birêveberî hebûbe, di hin qonaxan de beşeke zêde ji hêza hizba xwe heder daye, hêzek ku dikarî li çepera berevanî û li hem-berderketin li dijî dujminên cuda ên tevgera wê hatiba

bikaranîn. Gelek caran jî nerînên cuda bûne sedema dijayetî û nakokî, heta di asta veqetîn û şerê navxweyî de, bi bê vê ku bîr li diyalog û çareseriya demokratîk hatibe kirin.

Encama wan halatene digel dabeşbûn û lawaziya şiyana teşkilatî, gelek caran bûye bêhêvîtiya endam, alîgir û doştên wê Hizbê. Zivirîn bo armancên avakirina Hizbê, vebîranîna wê raştiyê ye ku Hizb emraz e ne armanc, vebîranîna wê ku Partiya Demokrat ji xelkê ye û bo xelkê ye, me tîne li ser vê bawerê ku tenê kultûra lihevkerin, yekrêzî û hevxeberî ye ku me ji armancên paşeroj û berjiwendiyên netewî nêzik dike. Di dawiyê de em divê erkê rêxiraweyî girê bidin bi berpirsiyaretiya dîrokî û exlaqîyên ku li ser milê Hizba me ne û bi çendîn nîfş e xwîn û qurbanê bo dide.

Eşkere ye ku Hizba Demokrat, tevgera neteweyiya Rojhilatê û gelê me hêjayê bihêzbûn, mezinatî û serkevtinên mezin in. Nehêja ye ku nîrxa şasiyan û bihevrenebûn, giraniyê bixe ser milê tevgerê û me ji rêya raşt a gihîştin bi armancan dûr bixe.

### **Rewşa Komar Îslamî**

Çawahiya hîlbijartiyên wê dawiyê ên Serkomariya Îranê û serildana xelkê bajarên tepeserkirî yên Ehwazê û hevdem hatina ser şeqaman a xelkê li herêmên din ên Îranê û serkuta xwînayîya wan xwenîşandanane, car din krîza desthilat û rewatiya rejîma Komara Îslamî piştî 42 sal desthilatdariyê xiste rojeva mediya û raya giştî a Îran û cîhanê.

Krîzên niha ên desthilat û civatgehên Îranê, wek welatek çend netewî, encam û lêkevtin raştevxweya siyasî û planên Komara Îslamî yên Îranê ne. Rêza dorpeçan,

»»» Doma R:3

krîza Korona, krîza aborî û wek xwedî berpîrsên Komara Îslamî dibêjin “nemana baweriya xelkê bi deşhilatê”, digel menca krîzan û arîşeyên din ên civakî, kultûrî, jîngehî, îdarî, gendelî, birêveberî û bêkarî, hejarî û... hwd, jiyana xelkê raştî pîrsgirêkan aniye. Xerc û bargiraniya wan krîzan û siyasîyê çewt li ser milê xelkê û nemaze civatgeha bê maf û perawêzxiştîyên Îranê ye.

Dirz û milmilaniya zêdetir di navbera deşhilat û herwisa berfirehtirbûna dirza nav deşhilat û xelkê de, bo hemû aliyekê eşkere ye, lê hilbijartinên wê dawiyê rûkê nû ê xelkê nerazî bi “na”gotinê nîşanê deşhilatê da ku di dîroka deşhilata rejîmê de bê mînak bûye, ev jî yekdengiya civatgeha Îranê û heta opozisiyonên navxwe û derve bû û tevî cudahî ji nerînên wan.

Encama wê yekdengiyê jî, beşdarînekirina piraniya xelkê xwedan mafê dangdanê di şanoya hilbijartinan de bû. Li hember wê hewêstê jî, “Weliyê Feqîh “na”yek din bi “na”ya tev xelkê nerazî got û di rêûresma sundxwarina Serkomariya Îbrahîm Reîsî de, carek din tekezî li ser beşdariya berbelav a xelkê kir. Wek hertimî behs ji pîlana dujminên derveyî bo lêdan li Komara Îslamî kir. Bi rênimiyên xwe wesfa “mudîriyetî cîhad”iya kabîneya Reîsî û lihemberderkevtin li dijî eniya dujminên xwe kir.

Hevdem komîsiyona merg li tawan û îdamên dehika 60`ê ya Rojî, bi “Alimî Ferzane” binav kir. Her wek bi diruştî di daxuyaniya Saziya Lêbûrîna Navdewletî de hatibû, bi hatina Serkomarê nû lê mohreyê berê yê serkutan, “siya mirin”ê zêdetir ji berê giraniyê dixwe ser Îranê. Bi vî awayî tê çavniherîkirin, digel berdewambûna serkuta sistematîk a deşhilatê û rewşa krîzî ya berê, serhildan û xwenîşandan li dijî rejîmê

bi siloganên herifînî bêne gorê.

Li derheq serhildan û xwenîşandana herêma Ehwezê û piştevaniya beşek ji xelkê bajarên Kurdistanê û Azerbaycan, Îsfahan û Tehran li xwenîşandanan, tevî serkuta xwînayî ji aliyê rejîmê ve, divê wê meşê ji nerizayetiyan wek dirêjbûna dengê “na” bi Komara Îslamî bê hesibandin ku li pey hilbijartinan hate gorê. Sedema serhildana gelê çewsayî yê Ereb li Îranê û herêmên netewî ên dinê yên wê cugrifiyayê, dizavire bo ser wê pêwendiyê ji dagîrkariyê ku di navbera nevend û perawêz de rîşe girtiye.

Bilî rehendên îdarî, aborî, ewlehî, perwerdeyî û jîngehên wê pêwendiyê ji dagîrkariyê, mijara talankirina çavkaniyên surûştî û paşê serkut û bînirxkirin û bi kêmkirina û bi ewlehîkirina wan herêmanê, heta tê zêdetir tê dirêjkirin û rehendên wê berfirehtir dibin. Raştîyek din eva ye ku ji egera rûdana û serhildanên bi vî awayî ku tê çavniherîkirin, eva herêmên bindest in ku bi nasnameya netewiya xwe ve dengê piştevanî û hevxeberî bo hev nîşan didin. Lewam em wek Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, pêka siyaseta me ya hertimî, netewên bindest ên Îranê bi hevpeymanên setratejîkiya xwe dizanin û em wek pîrensîpekê li ser wê tekezî dikin.

#### Partiya Demokrat û pîrsa hakimiyeta Kurd

Avakirina deşhilata Kurdî girêdayî bi pîrsa nasname, asayîşa netewî, vîdebîrin zilma netewî, demokrasî û ji hemûyan girîngtir meseleya hakimiyeta Kurd bi ser axa xwe de ye. Kurd xwe wek îtnîk-neteweyekê bê hakim di Îranê de dibîne ku bûye yek ji armancên sereke ên serkut û asmîlekirina navendê. Kurd jî, wek netewên din ên bindest, li ser vî bawerê ye ku bi bê pînsîkirina ser ji nû a çemka “Netewe” li Îranê, pêwendiya dagîrkariyê bo hertimî dimîne.



Li Îranê, pêwendiya dagîrkariyê û sistema yek aliya îtnîk-mezhebî, du cure civakên xwedî serweriya siyasî û gelên bê maf çê kiriye. Ew pêwendiyê du alî, meseleya mafê hakimiyeta siyasî kiriye meseleya sereke ya bi hev re jiyana îtnîk-netew di Îranê de.

Di demekê de êlîta îtnîk-neteweya serdest tekeziyê li ser sistema sêkolarî demokratîk dike, civatgehên ne ku sistema demokratîka sêkolar, bi tenê nikare hevsengiya pêkhatîyê, damezraweyî, dîrokî, çandî û siyasî bîne gorê. Her lewma girûpa duyem tekeziyê li ser zamînkirina hakimiyet bo me hemûyan ku divê nîşaneyên “demokrasî” û bingehekan pêkanîna deşhilat di Îranê de, ser ji nû ve pênase bikin, dike.

Bi bê wan pînsîkirinane, pêwendiya dagîrkariya navxweyî tê domkirin. Tevî evane, bi bê avêtina pîngaveke bingehekan bi wî rengî, naberaberiyek dîrokî ya dûbare tê berhevanîn. Di encamê de, tev îtnîk-netewên xeyrefars ji hemû şeweyên nûnerayetiyeke rasteqîne tene bîparkirin û dîroka bîparî û serkut, ser ji nû ve tê dûbarekirin ku eva bo herêmên netewan cihê qebûlkirinê nîne. Her lewma em wekî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê tekezî li ser mafê hakimiyet bo Kurd û herêmên bindest dikin. Di dawiyê de, em tekezî li ser du binyatên mafê netewî (serwerî) û demokrasî (çendnetewî) di paşeroja piştî Komara Îslamî a Îranê de dikin ku pêkanîna sistemeke fedraliya cugrifiyayî-netewî ye. Ev du binyatanane jî, bingeha rêkxistana her cure hevpeymanî û eniyekê demokratîk li dijî deşhilata

sitemkar a Komara Îslamî û misogerkirina mafên netewên bindest e.

Li derheq nav mala Kurd, tekezî li ser rêzgirtin ji cudahiya ra û nerîna siyasî û tolêrans digel tev rêkxiraw û kesayetî û aliyên nîştimanperweriyên Rojhilatê Kurdistanê dikin. Bo vî ku em bi gotereke netewî û platformeke hevbeşiya xebat, ber bi pêşwaziya hevkeşên çaniherînekirî ve herin. Armanca me ya mezin eva ye ku bi hevxeberî û bihevrebûn, ber bi avakirina Rojhilateke bihêz û bandorda pîngavan biavêjin, çimkî li cem me wisa ye ku xebata Bajar û Çiya li pêxema misogerkirina Rojhilateke bihêz, mifahwergirtin e ji hemû derfet û hêz û pitansêlek ku li xizmeta berjiwendî û paşeroja xebata me de ye. Li derheq pîrsa yekgirtinê jî, hewla me ya hertimî eva bûye ku digel aliyê din ê Demokratê bi şeweyek guncaw û cihê pesenda herdu alî, yek bigrin.

Di vî yada pîroz de, tevî pîrozbahiya 76`emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, ez serê xwe bo canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistan û malbatên wan û nemaze şehîdên me yên rêber dîtin.

Silav li îradeya polayî ya girtiyan siyasî ên xweragir. Silav bo hemû ev tîkoşerên ku li nav refên Hizba Demokrat de temenê xwe terxan kirine. Silavek emegnasî bo kêmdamên nav refên Kurdayetî. Silavek emegnasî bo Hêza Pêşmerge Kurdistanê li çiya û bajar û li tev tax û qatên nîştimanperwerên Kurdistanê. Bi hêviya yekrêzî û tebayî Serkeve hevxeberî

## Jidayikbûn bo armancek pêroz û merivane



N:Elî Munezemî

Îsal PDKÎ di 16'ê tebaxê (25ê Gelawêjê) de 76'ê emîn salvegera damezirandina xwe pêroz kir. Ew partiya han ku li ser xîmê “Komeleya Jiyaneweya Kurd” an ku “Komeleya Jêkaf”ê hate avakirin, di pêxema rastwegerandina armanca Kurdan, avakirina dewlet-neteweya Kurdî li ser erdê Kurdisatnê, hate saz kirin. Ew armanca han di heyamê wan 76 salan de guhertin bi ser de hatine û hatiye berfirehtir kirin û tekûz kirin. Niha ew partiya ne tenê bo liholêrakirina zordariya neteweyî li ser Kurdan, belkî herwisa bo nehêlana zordariya çînayetî û zordariya siyasî jî cehd û têkoşînê dike û armanca wê ya serekê pêkanîna Kurdistanek azad, civakek dadperwer û sîstîmeke desthilatdariya dîmokratîk a rastîn e li ser axa Kurdistanê di Rojhelata welêt de û nehêlana wan her sê şeweyên zordariyê, felsefeya hebûna PDKÎ diafirîne ku ew jî “azadî” ye.

Eger em bixwazin erka PDKÎ zelal bikin û “mîsyon”a wê bi başî xêz bikin, eva ye ku Dr. Qasimlo aniye ziman û dibêje ku “azadî binirxtrîn tişt e li jiyana merivan de. Azadî keramet û şexsiyetê dide meriv û nahêle ku meriv bibe bi mohre”. Yanî PDKÎ xwe di hember Kurdan de erkdar dibîne ku bi azadkirina Kurdistanê û bideştveanîna mafê danîna çarenivîsa gelê Kurd, pêkanîna sîstîmek xweşbijîv, dadperwer û dîmokratîk garantiya wê hindê bike ku takên Kurd bi bideştixistina maf û azadiya xwe, bibin xwediyê keramet û kesayetiya xwe û zordariya li ser wan



bê rakirin û ew êdî wek mohre li aliyê çî kes û aliyekê ve neyên bikaranîn.

Li gor hizr û ramanên Qasimlo, mafê çareya çarenivîsa gelan di çarçoveya serxwebûn û damezirandina dewlet-neteweyê de reng vedide. Ew bi anîna faktan li “Lênîn” ku alîgirê mafê danîna çareya xwenivîsîna gelan û wekheviya gelên piçûk û mezin bû, wî mafî bi bê damezrandina dewleta serbixwe a netewî, bi bê wate dizane.

Ew mafê serxwebûnê bo hemû wan neteweyên zorlêkirî ên cîhanê bi rewa dizane û wî mafî bo gelê Kurd jî di yekgirtina her çar parên Kurdistanê di çarçoveya yek welatê serbixwe de bi rewa dizane û di wê bawerê de ye ku karek han ne tenê cudabûn û perçekirina axa çî welatekê nine, belkî yekgirtina welatek perçe perçe kiriye ku berevajî îradeya gelê Kurd ew yek bi şeweyeke ne-xwezayî bi ser Kurdan de hatiye sepandin.

Cudabûna gelê Kurd li netewên din û yekgirtina wan, mafê yekgirtinê ye û ew yeka li mafê cudabûnê zêdetir e. Perçe perçekirina Kurdistanê ku berevajî îradeya gelê Kurd hatiye kirin û ew jiyana ku niha Kurdan heyî, bi dilê xwe hilnebijartî ye.

Yanî bêparbûna Kurdan li hebûna welatek serbixwe kosp û lemperek mezin e li ser rêya azadiya şeweya jiyane, azadiya siyasî û hemû cureyên din yê azadiyê ku fersenda xwe-realîzekirinê ji wan standîye û ew neçar hêştine ku dest ji kesayetiya xwe ya rastîn berdin û xwe li gor nîrx û buhayên çirûk û sexte rêkbêxin ku ji aliyê neteweyên dagîrkar ve bi ser Kurdan de hatine sepandin.

Ew givaş li ser jiayna gelê Kurd, her 2 şeweyên dîktatoriyeta zorîne li xwe digre: Ew dîktatoriyeta ku ji aliyê desthilatdariya siyasî a hikûmetên dagîrker ve li ser Kurdan tê meşandin û ew dîktatoriyeta zorîne ku ji aliyê pîrraniya civakê ve ku li neteweyên serdest ku Kurdistan di nava xwe de parve kirine, rû bi rûyê Kurdan tê kirin û ji ber ku Kurd cihê ye ji wan, rastî azar û eziyetê tên kirin.

Ku wisa lê hat, bes gihîştina Kurdan bi serxwebûnê û damezirandina dewlet-neteweya Kurdî, dawîpêanîna wan e li zilm û zordariya çar hikûmetên dagîrker û zalim, sê neteweyên kedxwar û zilimkar ku zordariya xwe li ser Kurdan dimeşînin. Bes felsefeya hebûna PDKÎ li ser raştiya jiyana Kurdan hatiye danîn û bi gihîştina wan bi azadî û serxwebûnê yê wê fersendê bide wan ku bi rengê xwe û bi gorekî nîrx û buhayên xwe jiyana xwe bixemilînin.

Azadiya gelan û serxwebûna wan dibe sedem ku zaf şeweyên jiyane yê bi rengên cuda peyda bin û jiyana bi şeweya pirrengî û ploralîstî li ser cîhanê pêk were û ew yek jî dikare bibe sedema çêbûna tolerans û fersendên nû bo xwederxiştin û îfadekirin û bilindbûna asta bexteweriyê û jiyaneke birûmet.

PDKÎ bo wê armancê hatiye çêkirin û yê xebata wê jî heta realîzebûna wê armancê dom bike.

## Ti dîktatorek bo hertim nikare bi tepeseriyê, deshîlata xwe biparêze



N: Homen Simko

Bi salan e ku xwenîşandanên nerizayetî di Îranê de bi dijî rejîma Îranê berdewam in û ev nerizayetî bi sedemên wekî: “bêdadiyê, gendeliya aborî, îdam, binçavkirina çalakvanên siyasî, civakî û mafê mirovî” ne, zulim û tepeserîya wan ji aliyê rejîma Îranê ve hemû sînore hovtiyê derbas kirine.

Ti sazî an rêkxistîneke navnetewî an dewletek, bi kiryar ji xwenîşanderan piştevanî nekiriye û rejîma Îranê zêdetir û hovanetir xelkê Îranê tepeser kiriye û herwisa tepeserkirina azadîx-az û xwenîşanderan berdewam e. Hekî em mêzeyê dîroka Komara Îslamiya Îranê bikin, bi rohnî bo me derdikeve ku rejîma Îranê ji destpêka şoreşa gelan li sala 1357an a Rojî ve heta niha bi 10an hezar kes li hundîr û derveyî Îranê de an bi terorkirîna kuştîye an îdam kirîye an di bin îşkenceayn de ew ji nav birne; Ji serhildana xelkê Rojhilatê Kurdistanê heta xwenîşandanên nerizayetî li parêzgeha Xûzîstanê û berfirehbûna xwenîşandanan di parêzgehên dinê de, bi taybet di wan 2 dehikên wê dawiyê de bi rohnî tê dîtin ku nebûna birêveberîyeke micid û bikêrhatî li astê seranserîya Îranê de bo evê ku xelkê nerazî piştî xwe pêve girêdin, û nebûna rêkar û rêçar-eyan û nebûna bernameyên demokratîk û demdirêj bona çareserkirina pîrsgirêkên civakî, siyasî û aborî, lew-maye ku çenebûye yekalîbûna sîstema desthilatdar bête guherîn û rê xweş be bona danana sîstemekî demokratîk li ser bîngeha berjewendiya civakê.

Qonaxên dîroka rejîma Îranê ji destpêka şoreşa gelan Îranê ve heya niha wê raştiye dide



ber çav ku rejîma Îranê ji siloganên xwe ên li destpêka şoreşê, dem bi dem û pêngav bi pêngav dîr ketiye û daye xuya ku ew rejîme bi tevahî rejîmeke dayxistî bi hizrên çewt û dîktatorîyeke di bin sîbera Ol de desthilata xwe sepandiye û didomîne. Dema ku rejîma Îranê bona berjewendiyên xwe û domandina temenê desthilata xwe kesên bîngehîn û karlêkerên rejîmê wekî Refsencanî kirine qurbanîyê berjewndiyê û ji bo xudî more û damezrênerên xwe jî emegdar nîne, daye xuya ku şiyana birêveberîya xwe ji dest daye. Xelkê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bi taybet netewên bê maf û jêrdeste Îranê ji wê rewşê bêzar bûne, êdî ti tişkeke wan nemaye ku jîdestbidin, rewşa jiyan û aborî û kar di wan heyamên dawiyê de gihîştîye bi diwartirîn rewşa xwe û bi sedema bêdadî, gendeliya aborî û îdarî, bêkarî û teror û kuştina dijberên rejîmê û xelkê xwenîşander, îdam û îşkencekirina girtyiyan roj bi roj temenê wê rejîma totalîter û dîr ji hemû prensîpên mirovî zêdetir dike û hêviyên rejîmê bo berdewamkirina desthilatê roj bi roj kêmrêngtir dibin.

Di wan heftiyên dawiyê de hawara nerizayetiyan xelkê, rêpîvanên nerizayetiyan ên masfxwazane ber-

firehî û micidî hatine li-darxistin û xelkê her yek bi awayekî, hevdiya xwe digel wan xwenîşanderan dane nîşandanê. Dengê nerizayetiya xelkê gihîşte guhê cîhaniyan û careke dinê rûkê reş û dijî mirovahiyê yê rejîma Îranê bi cîhanê nîşan daye. Navend û binkeyên nivîskar, hunermend û kesayetiyên naskirî yê sînema û tiyatroyê bûne hevdeng û dengê pêregihîştin bi daxwazên xelkê di torên civakî de belav kirine, em îro dibînin ku di torên civakî de zêdetir hewl bo belavkirina dengê azadîxwazî û mafxwaziya xelkê hatiye dan, lê axo ti welateke parêzerê mafê mirov û demokrasîyê qîrîna wan xwenîşanderan dibihîze? axo bi kiryar li derveyî Îranê ti welatek piştevanîyê ji wan xwenîşanderên nerazî dike? Rejîma Îranê êdî bi tenêman û îzolebûna xwe di cîhanê de bi asayê dibîne lê ew bi tenêman û îzolebûn pêşîra xelkê Îranê girtiye û kîna xwe hemiyê bi ser xelkê Îranê de dirêje.

Di wan vîdeoyên ku hatine belavkirin ji kombûnên nerizayetiyan xelkê Tehran, Tewrêz û cîhên din ên Îranê hatine dîtin û bihiştin ku xelk silogana “bihirîfê Komara îslamî” dide, dengê teqeyên çekan tene bihiştin û gulle û narincekên gaza bîberê bi

ser xelkê direşînin. Êdî rejîm gihîştîye qonaxekê ku bi tenê berevanî ji xwe, di kuştin û tepeserîya xelkê de dibîne. Rejîma Îranê êdî dizane ku xelk jê bêzar bûye û dawîya temenê wê ye ,lewma hewara xwe dibe bo tepeserîya bêrehmane û gullereşandin û kuştina xelkê, û bi wî awayî berevaniyê ji desthilata xwe dikê û ti girîngiyekê bi wê hindê nade ku pêlên nerizayetiyan dê gelek bihêztir û diwartir bin.

Rejîma Îranê bo tepeserkirina zêdetir û herwisa perdepoşkirina cinayetên xwe, hemû hewlên wekî qutkirina hêlên înternet û telefonên deverên aloz daye , bi wê kiryarê daye selimandin ku heta çî aştêkê ji dengvedana wan nerizayetên xelkê ditirse û qutkirina berqa bajarên jî bi tevahî ji sam û tîrsa rejîmê ji rêkxistin û hevahengiya xelkê ye, Belavbûn û destbideştîbûna wêne û vîdeoyên xwenîşanderan û serkuta hovaneya rejîmê û berteknîşandana xelkê, niha bo desthilatdarên wê rejîmê bûye kabûseke bê dawî.

Rejîma Îranê ku bi ti awayekî nekariye daxwazên xelkê nerazî dabîn bike, take rêya derbaskirina xwe ji wê rewşê, bi tirsandin binçavkirin û terora kesayetiyan û çalakvanên siyasî û civakî dibîne.

## Nerîna Lîderan



“Von der Leyen”:

“Guherinkariya Efxaniştanê sîleyeke qahim bi civatgeha navnetewî bû”.



“Tony Blair”:

“Bi sedema deştîbiserdagirtina Efxaniştan ji aliyê Talibanê ve û bicihhêlana hêzên Amerîka li Efxaniştanê, em hêzên Amerîkayê şermazar dikin û ev yeka metirsîdar û tirajîdiya ye”.



“Naftali Bennett”:

“Nabe bi zîndîkirina Bercamê werîsê rizgariyê bidine Îranê”.



“Javid Rahman”:

“Dema ku Îbrahîm Reîsî deştîlatdarê hêza dadweriyê bû, Îranê bînpêkirina mafê mirov, îdama zarokan, îşkence, îtirafa bizorê, û girtina xweserane li pey xwe anîbû”.

## 28'ê Gelawêjê, referandoma serxwebûna Rojhilat e!



N: Eskender Ceiferî

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, Komara Îslamî jî nîgeran e.

28'ê Gelawêjê jî ku tê de biryara cîhadê li dijî Kurdistanê ji aliyê Xumeynî ve hate dayî, ew jî weke Newrozê bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan deştîlatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwaştine merasîma Newrozê bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin. Gelawêjê êrîşî ser Kurdistanê hate kkrin lewma jî hem di Newrozê de û hem bi peyamên bi helkefta 28'ê Gelawêjê, yekrîziya rojhilat derdikeve holê. Rojhilatê Kurdistanê parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Peyama Navenda Hevkariyê bi helkefta 28'ê Gelawêjê jî, vî raştîyê nîşan dide ku referandoma vî carê li Rojhilat, ji bo hevrîziyê ye. Aliyên siyasî ên Rojhilat, berî çend salan li ser pêşwazîkirina hevpar ji Newrozê lihev hatin. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalîst û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn. Niha jî bi peyameke hevpar, nîşan dan ku 28'ê Gelawêjê ji bo wan hemûyan tê wat-eyekê. Piştî daxuyaniya hevpar a



ji bo 28'ê Gelawêjê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevger- eke mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vî carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyari- yên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke a hêzên wê rêxistina terorîst. Bi vî rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Newroza hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin.

Ji xeynî tevgerên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan tene çalakkirin. Plana herî dawî a Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bife- tisînin. Li gora zanyariyên çavkaniyê veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, eger tevlihevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî deştîlat çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, gir- tina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatiyan zêde dibe. Tepisan- dina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rejîmê. Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma Newrozê lê tevî vî jî xelk cejna xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide.

Her salek ku derbas dibe, ji bo Kurdan referandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî Teh- ranê li hemû navçe, gund û bajaran pêk tê. Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin deştîlata Komara Îslamî de, hîlbijartineke demokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hîlbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di Newrozê û 28'ê Gelawêjê de biryara xwe li dijî dagirker diştînin û soza xwe bi riya şehîd û cangori- yên niştîman re nû dikin.

Niha, referandûma serxwe- bûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên di nav Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê ve bi rêve diçe. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne. Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin ku bibin dengê di- jatiya gelê me ya li hemberî dagirker.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan deşt dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Qelaçolan, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi TISHK' a agir û rojê û bi tîrêjên dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya dayîka niştîman û cangoriyên serbestiyê û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rejîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û referandûma me di dema xwe de birêve diçe. Ew jî hev- girtîbûna xelk û partiyên.

## Ebdulêzîz Qasim: “Ez bi giştî xebat û siyaseta PDKÎ bi siyasetek dûrbîn, riyalîst, diruşt û cihgir dibînim, ku pêngavên wê hevseng û hevaheng in”



H: Keyhan Mihemedînjad

Me li derheq 76`emîn salvegera avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, hevpeyvînek digel “Ebdulêzîz Qasim” Nivîser û Siyasetmedarê Kurd ê Rojavayê Kurdistanê kir û navbirî di beşek hevpeyvîna xwe de daye zanîn: “Ez wekî tak, PDKÎ mezintir ji rêxistinekê yan partiyeke siyasî dibînim, ez bêhtir wê wekî mîratxwerê Komara Kurdistan dibînim”.

**P:** Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê li Rojavayê Kurdistanê çawa tê nîrxandin?

**B:** Hêjayê gotinê ye ku tevgera siyasî ya Kurdî li rojavayê Kurdistanê, her ji destpêka damezrandina yekemîn partiya siyasî li sala 1957`an ve, endam û alîgirên xwe li ser perwerdeyeke netewî xwedan kirine, û xelkê me heta vê rojê jî heştekî netewî yê bilind heye û rewşa parçên din yên Kurdistanê dişopîne, helkeft û bîranînên hemû aliyên Kurdistanê sax dike û bibîr tîne.

Bi baweriya min ti kes nikare dîroka gelê me ya hevçerx ji dîroka Komara Kurdistan û xebata PDKÎ û qehremaniya rêberên Rojhilatê Kurdistanê yên wekî Simkoyê Şikakî, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî cuda bike, û xelkê me şanaziyê bi dîroka xwe dike, lewra şanaziyê bi xebata PDKÎ û di nav de bi taybetî şanaziyê bi “Pêşewa Qazî Mihemed û Dr. Qasimlo”, bi pêşmerge û şehîd û xebatkarên PDKÎ dikin.



**P:** Pêwendiyên we wek nivîser û siyasetmedar digel PDKÎ di çi asteke de bûye?

**B:** Bêhtir ji ber hilkevta cugrafîyayî tîkiliyên civakî, siyasî û rewşenbîrî heta demekî nêzîk gelekî kêmbûn, lê piştî krîza Sûriyê û bi taybetî piştî peydabûna Internet û tora civakî, ew sînoren dagîrkariyê yên di navbera Rojava û Rojhilatê Kurdistanê de hatin şikandin, ji bîra me dihêt û ticarî nayê jibîrkirin ku xelkê Rojhilatê Kurdistanê bi dirûşma “Kurdistan yek parçe ye, Qamişlo Helepçe ye” piştgiriya xwe ji bo serhildana Qamişloya di Adara 2004`an de nîşan dan, û bi dîtina min ku roleke mezin ya PDKÎ di avakirina van tîkiliyan de heye, ku îro tîkiliyên baş di navbera Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê de hatine dirûstkirin, hêvîxwaz im ku ev tîkilî bihêztir bibin.

**P:** Xebata Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, çi bandorek li ser hevkeşeyên siyasî yên Kurdistanê mezin danaye?

**B:** Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, bandoreke mezin heye û herwisa rêz û qederekî xwe yê mezin di dilê her kurdperwerekî de heye, û wekî Partiya “Dayîk” tê naskirin, û PDKÎ bo sedema binyat û hîmayên netewî yên wekî alaya Kurdistan, pêşmerge û sirûda netewî ya “Ey Reqîb” ku li serdemê Komara Kurdistanê de hatine danîn, ku heta îro bûne hîmayên netewî li tevaya Kurdistanê.

Hêjayê gotinê ye ku “Pêşwa Qazî Mihemed” yê nemir bi şadeta xwe bû mînakek dîrokî ya bêhempa bo gelê Kurd, lewra rêberên mezin li pey hatin wekî Dr. “Qasimlo” yê nemir û Dr. “Şerefkendî” ku bûne stêrk û sembolên xebatê ku bandorek wan ya mezin hebû li ser dirûstkirina siyaseteke Kurdî ya nûjen, nemaze pêvajoya “Rasan”.

Ez wekî tak, PDKÎ mezintir ji rêxistinekê yan partiyeke siyasî dibînim, ez bêhtir wê wekî mîratxwerê Komara Kurdistan dibînim.

**P:** 25`ê Gelawêja îsal 76`emîn salvegera avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bû, tu bigiştî xebata wê partyê çawa dibînî?

**B:** Ez bi giştî xebat û siyaseta PDKÎ bi siyasetek dûrbîn, riyalîst, diruşt û cihgir dibînim, ku pêngavên wê hevseng û hevaheng in, bi zanîbûn kar û xebata xwe çi li rojhilat û çi li Herêma Kurdistanê û çi li Ewropayê berdewam dike, PDKÎ bi destpêkirina xebata xwe ya bi navê “Rasan”ê ruhek nû da xelk û pêşmerge xwe û bi xebata Çiya û bajar cardin selmand ku ew dikare li hember dirindetirîn dujminê deverê derkeve û hêviyek da xelkê Rojhilatê Kurdistanê. Ez hêvîxwaz im ku PDKÎ rolek mezintir hebe û bigihîje aramcên xwe bi bideştixistina mafên netewî yên gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û 76 saliya Partiyê, li tevahia gelê Kurd, malbatên serbilind ên şehîdan, pêşmerge qehreman, endam û alîgirên PDKÎ pîroz dikim û hêviya serkevtinê bo we yên birêz dixwazim. Bijî kurd Bijî Kurdistan

## Di parêzgeha Urmiyê de destberdan ji hînkariyê zêde bûye

**B**irêvebera Giştî ya Perwerde û hînkariya rejîma Îranê li Parêzgeha Urmiyê “Mehîn Menafî”yê gotiye ku zêdetir ji 12 hezar dersxwanî dest ji hînkariyê berdane.

Herwisa “Mehîn Menafî”yê got: “ Di heyama sala derbasbûyî de hezar û 179 dîbiştanî û 10 hezar û 719 dersxwanî li pola 2ê ya navendî(debîrstanî) dest ji hînkariyê berdane.

Herwisa wê perpirsa rejîma Îranê gotiye ku destberdana wan dîbiştanî û dersxwanan ji hînkariyê tevî pîrsgirêka Koronayê, girêdayê pîrsgirêka Kultûrî, aborî, hejarî, bawera şaş a dayîk û bavan bo pêkanîna jiyana hevpar daye zanîn.

Tevî wan hemû sedeman ku “Mehîn Manafî”yê bas kiriye, di heyamê epîdemiya Koronayê de, nebûna înternet û kereştayên hewce yê hînkariyê, yekek din ji sedemên bîngehîn ên destberdana dersxwan û dîbiştaniyan ji hînkariyê ye.

Cihgirê Fêrkariyê yê Pola Seretayiya Wezîrê Perwerde û Hînkari-



yê, “Rêzvan Hekîmzade” li rêkeftiya 27ê meha Pûşpera sala 1400a Rojî de gotibû: “Pêka amara navenda Amarê, 210 hezar dersxwanên destberdayî ji xwendinê di Îranê de hene ku pêka sala derbasbûyî 142 hezar kes zêdetir bûye”.

## Du Kolber li encama teqeyên hêzên leşkerî yê Îranê li ser sînorê Baneyê birîndar bûn



**R**oja Sêşemî 26ê Gelawêjê, du kolber ên bi navên “Xelîl Xalidî” kurê Ebdula û “Fireydûn Mihemedzade” kurê Mehmûd xelkê gundê “Zerwava Xwarê” ser bi bajarê Baneyê, li encama teqeyên hêzên leşkeriyên Îranê li ser sînorê “Hengejal”ê birîndar bûne.

Hêzên leşkeriyên Îranê bi bê aghdarkirina berê, teqeya rasterast li wan du kolberan û hejmareke din ji kolberan kirine.

Ew du kolbere bo tedawiya pizîşkî bo yek ji navendên dermanî li bajarê Baneyê hatine veguhaştin.

## Yek ji birîndarbûyê bûyera teqîna mînê li Dêhloranê canê xwe ji dest da



**Î**ro Yekşemî 24ê Gelawêjê, “Mehdî Cevadî”, yek ji birîndarbûyên bûyera teqîna mînê li bajarê Dêhloranê, bi sedema kûriya birînen xwe canê xwe ji dest da.

Ew welatiye di encama wê teqînê de herdu piyên xwe ji dest dabûn.

Îro Yekşemî 24ê Gelawêjê, “Elî Ekberî”, xelkê bajarê Dêhloranê ji fermanberên Navenda Pûçkirina Mînan bi sedema teqîna mînê demûdeşt canê xwe ji dest da û Nasir Xudayî û Mehdî Cevadî jî birîndar bûne.

Ew sê kese bi sedema teqîna mîneke dije kes a bi navê “Walmêr”, tûşî wê bûyerê bûne.

## Kurdiştan û talankirina şûnwarên dîrokî yên wê



N: Bêhzad Qadirî

W: Bêhzad Simko

Mîratên çandî bi tevahiya wan şûnwaran tene gotin ku ji berê ve mane û nirxeke çandî hene. Ew şûnwarane dibe bîneyekî kevnar û dîrokî bin an bihayeke bi nirx wekî resmeke berê be û di îro de wan diparêzin heta ku bigihînin bi nivşên paşrojê.

Mîrata berê ên bicihmayî, li ser şirovekirina dîroka mirovahiyê bandordar e. Parastina wan mîratane bas ji eniyên berê dike ku di hundirê her yek ji wan de çîrokeke veşartî heye. Em dikarin di hevokekê de bibêjin ku, mîrata dîrokî û çandî, me û dîroka me bi hev re girê dide. Dîrok yek ji pêkhênerên “nasnameya çandî” ye; Di vê navberê de “mîrata çandî û şûnwarên dîrokî” bi hemû aliyên xwe ve, beşek in ji dîrokê. Cihan teji ji mîrat û şûnwarên dîrokî ye; Gelek gund û bajar, çend bîna an cihên dîrokî an resm û nerîteke xwecihî hene ku parastina wan dibe sedema pêwendiya rûniştîyên wan cihan bi derbasbûyên xwe ve. Ji aliyê dinê ve ew mîrat û şûnwarên ku mozexaneyan, bînayên dîrokî û cihên giştî li xwe digre, beşek ji mîrata netewî ne û dikarin bibin bi cihê balkêşandinê û hemû cihanê bo aliyê xwe rabikêşin.

Di Kurdiştanê de bi sedema nebûna dewlet û desthilateke Kurdî, bi berdewamî ji aliyê dagîrkeran ve hewl hatiye dan ku dîrokeke sexte bo me çêbikin û çêkirine jî, û ew hewlên wan bi tenê bo asmîlekirin û êrîşa çandî nebûye, belkî talankirina mîrata çandî û şûnwarên dîrokî yên me tim di pîlanên wan de hebûne da ku nehêlin ew girêdana me bi rêya



şûnwarên me digel derbasbûyî me hebe.

Dizîn û talankirina şûnwarên dîrokî yên Kurdiştanê ji aliyê rejîma Îranê û Spaha Pasdaran a terorîst ve, bi tenê kiriyareke dijî mirovahiya nû ya wan dizên mezin nîne, belkî çendîn sal e ku mafiyayên rejîmê û ji hemûyan girîngtir, darûdeste û malbata “Elîekber Haşimî Refsencanî” bi rêya hin kesên firsetçiyên qazancxwaz û pereperest li Kurdiştanê, bi awayên cuda mijûlê talankirina hemû şûnwarên dîrokî yên deverên cuda ên Kurdiştanê ne. Eva jî di halekê de ye ku piraniya wan şûnwarên dîrokî yên Kurdiştanê bi sedema guhnedan û nûjennekirinê, an ji nav çûne an yan ber bi jinavçûnê ve çûne.

Di wan çend dehikên derbasbûyî de, hêzên rejîma Îranê bi hevkarîya kesên girêdayê xwe li Kurdiştanê ku piraniya wan ser bi Spaha Pasdaran in, bi hêcetên cuda, mijûlê dizîn û derxistina wan şûnwarên dîrokî yên Kurdiştanê ne. Rejîma Îslamî ya Îranê bi awayekî sistematîk û hevşeweyê dizîna hemû çavkaniyên dahatê li Kurd-

iştanê, mijûlê talankirina şûnwarên dîrokî ye û heta niha çendîn hezar ji tiştên giranbeha û berhemên dîrokî ên bi nirx ku nîşanderê kultûr û şarîstaniyeta Kurdiştanê ne, talan kirine.

Di dehika 70an a Rojî de, taqim û bandên girêdayê Refsencanî û kurên wî, bi piştevaniya Spaha Pasdaran û Wezareta Îtîla`atê, di piraniya cihên Kurdiştanê de kersete, tişt û berhemên dîrokî talan kirine.

Herwisa di wan salan de bû ku Spaha Pasdaran a rejîma Îranê bi rêya kesên firsetçî û bi piştevaniya aliyên nenaskirî ên xwecihî, mijûlê kolandin û talankirina şûnwarên dîrokî ên bajarê Seqizê bûn û di gundên wekî “Kanî Niyaz, Başmax, Turcan, Şîwetû, Îshaq Ava û Boxelû”yê û herwisa li deverên Urmiyê jî mijûlê kolandina gir û şûnwarên dîrokî bûn ku di hin cihan de jî pêka gotina xelkê wê deverê, kesên nexwecihî yên bajarên din wekî bajarê Tehran, Îsfahan û Şîrazê digel wan bûne. Dizîn û kolandina şûnwarên dîrokî ên Kurdiştanê di wan

çend salên derbasbûyê de ber bi zêdebûnê ve çûye û piraniya wan şûnwarên ku tene dîtin bo parêzgehên din ên Îranê û derveyî welat tene veguhaştin.

Dizîna şûnwarên dîrokî ên Kurdiştanê bi tenê bi rêya kolandina cihên dîrokî nîne û çend salan berî niha, bi sedema nebûna çavedêrî û xemsariya aliyên pêwendîdar, nêzî 30 parçe tiştên dîrokî ji mozexaneya bajarê Kengawerê hatine talankirin. Kûzikên cuda, tabût û kêlên qebran ku dîroka wan dizavirê bo serdemê Eşkanîyan û çendîn şûnwarên destpêka Îslamê, beşek ji wan kereştanane bûn ku ji wê mozexanê hatine talankirin.

Bitenê di serdemê Serkomariya “Mehmûd Ehmedîni-jad” de 600 parçe kereştîyên dîrokî ji mozexaneya “Millî” de bo derveyî welat hatine şandin ku piranî ji Kurdiştanê hatibûne talankirin. Di dawiyê de em digihîjine wê encamê ku: “Rejîma Îranê bitenê şûnwarên dîrokî ên Kurdiştanê talan nake, belkî dixwaze nasnameya neteweyekê talan bike”.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Efûya Navnetewî dîsan li derheq îdamkirina “Heyder Qurbanî” girtiyê siyasiyê Kurd huşdarî da

Saziya Efûya Navnetewî car din li ser rûpela xwe ya “Twitter”ê teîd kir ku “Heyder Qurbanî” girtiyê siyasî yê Kurd di bin îşkenceya hêzên rejîma Îranê de raştî îtirafa bizorê hatiye û ji “Elî Xamineyî” rêberê rejîma Îranê û berpirsên din ên pêwendîdar ên rejîmê xwaşt ku hikma îdama wî girtiyê siyasî yê Kurd hilûşînin.

Saziya Efûya Navnetewî teîd kirye ku divê dadgeheke dadperwerane bo “Heyder Qurbanî” bi rê ve here.

“Heyder Qurbanî” girtiyê siyasî ê temen 48 salî û xelkê bajarê Kamiyaran ê ser bi parêzgeha Sineyê meha Rezbera 1395`an a Rojî, bi tohmet “hevkrîkirina di kuştina çend kes ji bikirêgirtiyên rejîma Îran”ê hate girtin.

Meha Reşemeya heman salê televîziyona Îngilîzî ziman a “Pres Tv” bi nîşandana dêkomînterek bi navê “ajotvanê merg” beşek ji îtirafa bizorê a wî girtiyê Kurd belav kir.

Heyder Qurbanî, 14`ê Rezbera 1398`an a Rojî, bi tohmetên “lêdana fîzîkî û birîndarkirin bi çek, beşdarî di kuştina bi zanebûn, hewildan û revîn ji peyketin û hikimdan û cezadan, hevkarî li kuştina bi zanebûn, deştêpêka kuştina bi zanebûn, guherîna pilaka maşînê, dizîna mirovan û wergirtina malê dizîvê, hevkarîkirin digel yek ji Hizbên Kurdî ên opozsiyonên dijberên rejîma Îranê” di taya 1 a dadgeha Keyferî ya Sineyê de hate cezadan.

Ew girtiyê siyasî yê Kurd di dadgeha taya 1 a Keyferiya Sineyê de bi sê car girtîgeha te`izîrî her yek ji wan 30 sal girtîgeh hate cezadan.

Heyder Qurbanî, roja Sêşemî 8`ê Rêbendana 1398`an a Rojî, ji aliyê taya 1 a dadgeha Înqîlab a Sineyê ve, bi tohmata “bexî, hilgirtina çekê li dijî rejîmê û nîzama rejîma Îslamî” bi îdamê hate cezadan.

## Welatiyekî Kurd li bajarê Pîranşarê hate binçavkirin

Roja Sêşemî 26`ê Gelawêjê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Selah Osmanî” temen 44 salî, xelkê gundê “Xirape”yê û rûniştîyê gundê “Rizgarî(Karxane Qend)”ê ser bi bajarê Pîranşarê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî, ew welatiye binçav kirine.

Ew welatiye piştî binçavkirinê bo ciheke nexuya hatiye veguhaştine û heya niha, ji qedera wî ti zanyariyek ji ber deşt de nîne. Heya dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema girtin û tohmata ku bi ser “Osman” de sepandine ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

## Îrec Sofîmihemed dawî bi gireva birçîbûna xwe anî

Îro Sêşemî 26`ê Gelawêjê, girtiyê Olî yê girtî li girtîgeha bajarê Urmîyê“Îrec Sofîmihemed”, ku ji roja Şemî, 9`ê Gelawêjê ve deşt avêtibû gireva birçîbûnê , dawî bi gireva birçîbûna xwe anî.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew girtiyê Olî li ser soza berpirsên girtîgehê li derheq veguhaştina wî bo girtîgeha bajarê Mihabadê dawî bi gireva birçîbûna xwe anî ye û piştê ji oda take kesî ya girtîgehêa bajarê Urmîyê bi benda giştî hatiye veguhaştin.

Roja Şemî 9`ê Gelawêjê, “Îrec Sofîmihemed” bi nîşaneyê nerizayetiya xwe li derheq redkirina daxwaza veguhaştina wî bo girtîgeha bajarê Mihabadê deşt avêtibê gireva birçîbûnê û piştî deştavêtin bi gireva birçîbûnê bo yek ji odeyên take kesî yê girtîgeha bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Di Meha Banemera sala 1399`an de, ew welatiyê xelkê bajarê Mihabadê bi tohmata “hevldan li dijî tenahiya netewî bi rêya endambûn li girûpên Selefî” ji aliyê taya 2 a dadgeha şoreşa bajarê Urmîyê bi serokayetiya dadver “Şêxlû” bi 15 sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan û ew cezaye ji pêka terha kêmkirina cezayên girtiyên te`izîrî bo 10 sal girtîgehê hatiye kêmkirin.

“Îrec Sofîmihemed” sala 1398`an aRojî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî bi dawîhatina lêpîrsînê, bo girtîgeha bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Ew welatiye berê li sala 1396`an bi tohmata “endambûn li girûpa Ensar El-Îslam” ji aliyê taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê bi 18 mehan girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan ku piştî bi dawîhatina heyama cezayên wî li sala 1397`an ji girtîgeha bajarê Urmîyê hatibû azadkirin.

## **25`ê Gelawêjê destpêka qonaxek nû ji xebata netewayetiya xelkê Kurdistanê ye**

